“Ez di cîhaneke wilo de jiyam”

Cankurd, May 4, 2010

Di cîhana me de, li hember (1.6 Milyar) mirovên qelew, ku ji ber giraniya govdên xwe dinalin, û gelek nexweş in, û pêwîstiya wan bi çavdêriya saxiyê heye, bêtir ji milyarek mirovên hejar hene, ku bêtirê wan zarok û jin in, herroj ji ber birçîbûnê dinalin, û bê harîkariya pêwîst nikanin bijîn.

Di cîhana me de, ku bi milyaran mirov hene, yên pêdiviya wan bi derman û ava paqij, bi bayê paqij û bi ciyê serîdanîn û razanê heye. Li hember wan komikên di xaniyên bilind de dijîn hene, ewên ku difnên wan di nav ewiran de dimînin, û bi bazariya tiving û debanan, top û rakêtan, bombe û fîşek û gulleyên peqok, maldartir dibin. Avakirina cebilxane û debanxaneyan li bal wan ji avakirina xistexane û dermanxaneyan giringtire.

Di cîhana me de, li aliyekî, ewên ku Nivîskarê Alman Hans Magnus Ezenberger bi “Ziyankêşên radîkal” bi navkirine, hene, ewên tengemejiyên oldar ji xwe re dikine çek û deban û pêkar, bi xûnrêtinê çavên mirovan dişkînin, tirsê dixînin dilên wan, û wan wekî pezekî bê hiş û bê raman, li pey xwe dibine ser şirovekirinên reşbîn û nakevin çi mejiyan, û li aliyekî gelek deselatî û serokatiyên li ser xûnê hatîne avakirin hene, ewana jî bi nave “Nûkirinê”, “Demokratîkirinê”, û “Azadkirinê”, bi kîn û nevîneke bê wekanî li hember ên ne wek xwe dilivin û dilebitin, dixwazin teviya cîhana mirovatiyê têxînin bin çengên xwe, ên berê hatine jarkirin, hîn bêtir jartir bikin, û dergahê hemî kelehan bi dare zorê, bo talankerên mal û aboriya heme civakan vekin.

Di cîhana me de, ciyê ên bê diran, bê hêz, bê kanîn û bê viyana pêşveçûnê nîne, ciyê ên hejar û belengaz, ên bê hîvî û viyan sotînxane ya tunekirinê, pişaftinê, bêwatekirinê û nemanê ye. Weku tu nikanî di firokekê de ciyê rûniştina xwe bidestxînî, bêyî ku berê mafê wî ciyî hatibe dayîn, bêyî ew danişgeh ji te re hatibe bêlîkirin, û bêyî ku te jê re bizav û karkiribe.

Di cîhana me de, ku bi milyaran mirov hene, ji bo kar û xebata xwe ya rojane, kêmtir ji 2 Dollaran mafê destê xwe distînin û herroj bi hezaran mirov ên ciwan “Bo pençek

Dollar” têne kuştin, hinek kes hene, ku bo xwarinekê ji mêvanên xwe re, an bo kirrîna diyariyekê ji xanimekê re, bi hezaran Dollar di çavlêdanekê de ji dest didin.

Di cîhana me de, ku dewlet hene, bo pîremirovan, nesaxan, ewareyan “bêkaran” û bo mirovên bê mal “berder” an bêkes, hîç harîkariyekê nakin, lê bi Milyaran pere “di pencereyê re davêjin”, piştvaniya xudan ên Bank û çêkirxaneyan, saziyên maldar û çînên xanedan dikin û ji wan re ji pereyên gelê hejar pareke mezin terxan dikin...

Ez di cîhaneke wilo de ji dayîk bûm, û teviya jiyana xwe di rewşeke wilo bêmaf, bê dad û bê wijdan de jiyam, û herdem dilê min ji xeyd û xemgîniyê dihat guvaştin û min pirs ji xwe dikirin, gelo! Çima mirov wilo ne? Wekî gur û keftaran, ji xûnrêtinê hezdikin, zorbaziyê dikin û nevînê dilên wan dagirtiye?

Ez baş tênegiham veşartokên vê cîhanê, hema ez fêr bûm, ku ciyê hejaran baştir û çêtir nabe, heger di dilê wan de tova viyanê tune be. Divê mirov ji bo başkirin û geşkirina jîn û dorgeha xwe, ji damekirina xwe derkeve, perdeya tariyê û mijê xewê ji ser xwe bavêje û bi hêrs û wêrekî box we, bo malbata xwe, bo civaka xwe bibêje:

“Vaye ez li vi rim, ez heme, ez xebat û kefteleftа xwe dikim, da ez nemînim blindest û hejar, da ez nebim koleyê çi kesî, da ez ji tengiyê derkevim û azad bijîm.”

Civak ên jar û hejar jî, yên binzorkirî û basikşikestî jî wilo ne, bê viyana serkeftinê nikanin xwe azabikin, xwe ji koletiyê û paşketinê rizgar bikin.